**Bernameya Çalakîyan ya 20-26ê Hezîranê**



**<u>20ê Hezîranê Roja Duşemê</u>**

**Seet: 15:00- 18:00 Cîh: Kargeha Navenda Lêkolîn û Perwerdehîyê ya Bêtundbûyînê: Rêxistîbûna Bêtundî**

Kargeha Rêxistîbûna Bêtundî ji bo em bikaribin çalakbûyîna xwe bihêztir bikin, dê rêyên nû li ber me veke û me ber bi hevgirtinê bibe. Rêxistinek bêtundî çawa pêk tê em ê li ser wê bifikirin div ê kargehê de.

Em ê bala xwe bidine vê yekê ka di nava rêxistinekê kîjan cureyên tundîyê pêk tên, em ê li ser helwest û rêbazên tundîyê minaqeşê bikin û tecrubeyên xwe bo we parve bikin.

Hejmara beşdaran dîyarkirî ye, kesên ku dixwazin beşdar bibin bila ji kerema xwe re ji vê navnîşanê re merhaba@siddetsizlik.org maîlekê bişînin.

**Seet: 17:00- 19:00 Cîh: Cezayîr Panel: LGBT+ yên bi virusa HIVê ketine vedibêjin***

Em dizanin ku roj bi roj newekhevî û helwestên nefretî ên li hember LGBT+yên virusa HIVê bi wan re heye zêdetir dibe. Dema ku em dîroka Kuîrê û têgehên HIV û LGBT+ yan bi hev re dinivsînin em hêz û çêja xwe ji vê têkoşîna hevgirtî digirin. Ji bo em pirsgrêk, tecrube û pêdivîyên xwe derxînin pêş em ê di hefteya Serbilindiyê de li ser navê LGBT+yên HIV bi wan re hey eli hev bicivin.

Axaftvan: Defne Guzel, Oguzhan Nuh

Armanca me ew e ku LGBT+yên HIV bi wan re heye beşdarî vê çalakîyê bibin. Dê di vê çalakîyê de kesên beşdar bûne tecrubeyên xwe bo me parve bikin.

**Seet: 17:00- 19:00 Cîh: Cezayîr Panel: Em çima wêjeya Kuîrê Dikin?**

Dê bi minasebeta hefteya Serbilindiyê sê nivîskarên lubunya Deniz Erkaradaxw, Firat Uran û Mertcan Karakuş ligel Buşra Mutlu û Seçil Epikê bicivin. Buşra Mutlu û Seçil Epîk ew kes in ku wan di sala 2021ê de weşanxaneya bi navê Umamî Kitapê ya quîr feminist ava kirine.

Ji bo em bizanibin bê ka “berxwedan” di edebîyatê de bi çi rengî ye, em ê dengê xwe bilind bikin û tecrubeyên xwe bo we parve bikin em ê bicivin.

**Modertator**: Seçil Epik

**Axêver**: Deniz Erkaradag, Firat Uran, Mertcan Karakuş û Buşra Mutlu

**Seet: 19:00- 21:00 Cîh: Cezayîr Panel: Bi+ Li ber xwe didin**

Em ê li ser pratîkên xwe yên berxwedana ji Manîsfestoya Biseksuelê heta niha li dijî helwestên bi+fobik pêk hatine biaxivin.

Bêrîya niha bi 32 salan bi+yên ji ber monoseksîzê nedihatin dîtin an nedihatin ber çavan, dengê wan nedihat bihîstin û kesên ji bilî wan ew pênase û terîf dikirin pênûsa xwe hildane destê xwe, ji ber vê hêrsê êdî teqîyane û gazî herkesî kirine da ku bîfobîya xwe ya di dil de û ji derve de bibînin û pê re rû bir û bimînin. Heta îro jî hê bî+ bi fobîyên mîna bi herkesî re radizên an sêrgêjîyê tên tawanbarkirin. Lê bi+ ligel vê rewşê jî li dijî cihana cîshet a lubunyabûna nabînin li qadên lubunyayê li ber xwe didin. Em ê di vê çalakîyê de ji pêwendîbûna xwe heta qadên aktivîzmê, nexuyakirina em li her derê û carinan jî di dilê xwe dijîn û tevgerên bi+fobîk pratîkên xwe yên berxwedanê û ev pratik çawa vediguherin, em ê li ser van mijaran biaxivin û bi hev re xurttir bibin.

**Seet: 19:00-21:00 Cîh: Cezayîr Panel: Ji Hêla Perspektîfa Tendurustîya Gel ve Xwegihandina Mafê Tendurustîyê ya Karkerên Seksê**

*Karkerên Seksê dikarin xwe bigihînin mafê tendurustîyê?*

Mafê tendurustîyê mafekî bingehên ê mirovahîyê ye, em jî bawerîya xwe bi vê tînin û dipirsin asta xwegihandina karkerên trans+ seksê ya tendurustîyê d içi rewşê de ye? Di encama 19 hevpeyvînên bi karkerên seksê re, ji salên 90î heta niha div î warî de çi guherîye? Dê ji hêla pisporê tenduristîya gel ve bê moderekirin ev panel û dê encamên lêkolînên ji hêla perspektîfa gel ve û tecrubeyên şexsî bo we bên parvekirin.

Axêver: Eylem Çagdaş, Iris Mozalar, Onur Şimşek

**<u>21ê Hezîranê Sêşem</u>**

**Seet: 14:00- 17:00 Cîh: Cezayîr Panel+ Kargeh: Ji Hêla Perspektîfa Femînîst Kuîrê ve Têkoşîna Azadîya Ajalan**

Bi armanca ku em Meha Serbilindşyê Pîroz bikin em li hev civîyane. Di vê çalakîya me de piştî pêşkêşîyek ku Kollektîfa Azadîya Ajalan bi kurtasî xwe dide naskirin dê aktîvîsta LGBTI+ vegan Doga Bayraktar derbarê ji hêla perspektîfa kuîrê ya femînîst ve behsa veganîzmê bike Em ê ji Navenda Xebatên BurHakê Ozge Ozgunê re bi xebatek kargehî ya interaktif re têkevin lêgerîna rêyên queera vegan.

Em hemû kesên vegan/nevegab vedixwînin çalakîya ku bi hevkarîya Komîteya Hefteya Serbilindîyê ya Stenbolê, Kollekftîfa Azadîya Ajalan û Navenda Xebatê ya BurHakê re pêk hatîye.

Ji bo herkesi jîyanek bêçîn, azad, vegan, kuir, bêkedxwarî, bêpatron û bêqewad pêkan e!

Moderasyon: Ozan Aybar

Axêver: Doga Bayraktar, Ozge Ozgun

**Seet: 16:00- 17:30 Cîh: Muze Gazhane Atolye: Em Nikarin Bi Cîh Bibin Huş be Tu Dizanî: Mafê LGBTI+yan ê Xwecîhîya Bajarî û Lêgerînên Çareserîyê yên Lokal**

Em ê div ê çalakîyê de li bersivên van pirsan bigerin: Mafê LGBTI+yan ê bicîhbûnê, tecrube û pirsgrêkên rojane çi ne? Çi astengî li ber mafê bicîhbûna LGBTI+yan heye? Rêveberîyên Xwecîhî dikarin xebat û hevkarîyên çawa bikin di vî warî de?

Moderasyon: Anil Kocaogullari- Koma Xebatê ya Wekhevîya Civakî ya Konseya Bajarê Stenbolê

Axêver: Eylem Çagdaş, Nêrînek Dîrokî li Pirsgrêka Bicîhbûnê Niyaz Uslu Teşebusa Lambda ya Stargehê Zerrin Akhan- SPOD Xebatên Modelkirinê û Pêşencamên Lêkolînên Qadê

**Seet: 17.00- 19:00 Cîh: Cezayîr Speed Datîng**

Em dizanin hûn jî aciz bûne Ji OkCuoidê, Tinder, Tehakuma femfobîk ya li Hornetê û ji pirsa li Wapayê ya tu çalak î an naçalak î. Belê ji ber vê sedemê bi xwe me speed datin ji bo we anî! Em ê ji bo we cihên ewle ava bikin û di şevekê de berê xwe bidin gelek randewuyan☺ Em ê derfeta demê bidin beşdaran da ku bi hev re sohbete bikin. Di dawîya Speed Datîngê heke hûn ketibin serê hev ji bo ku piştre hûn xwe bigihînin hev hûn dikarin hejmar û navnîşanên xwe bidine hev ☺

Nîşe: Ev der cîhê me yê ewle ye. Ji kerema xwe li hessasîyetên hev baldar bin.

**Seet 17:00- 19:00 Cîh : Zoom Gotûbêj: Aktîvîzma Lihevkirinî**

*Em di warê gotûbêjên xwînerên Kaos GLyê de li ser têgeha lihevkirinê nîqaşê vedikin. Di serî de wek têgehek hiqûqî ya xumam di jiyana me de belavbû têgeha "lihevkirinê" lê niha ji bo me aktvîst, akademisyen û LGBTI+yan tê çi wateyê? Heke helwestek lihevkirinî tune be meriv dê bikaribe li hemberî tahakumê têbikoşe? Helwestên rexneyî yên ji bo vê têgehê çi ne?*

Em ê div ê çalakîyê de ligel Sîbel Yuklerê bin ku ew bi nivîsa xwe ya bi navê Ezmuna Lihevkirinê ya Rêxistinên Mafî bi Tevgera LGBTI+yan re û herweha dê Asli Alpar jî li gel me be ku ew jî bi nivîsa xwe ya bi navê Lihevkirin Têra Me Nake: Derbarê Têkoşîna Azadîya Yekparebûnê" di kovarê de cîh digire.

Moderasyon: Umut Guven, Mêvan: Asli Alpar, Sibel Yukler

***Kesên ku dixwazin beşdar bibin divê formê beşdarbûnê dagirin.***

**Seet: 18:00- 19:00 Cîh: Zoom Pêşkêşî: Em Yextîyar dibin Lubunya***

Derbarê van mijaran de anket hatin çêkirin: Li hemû bajarên Tirkiyeyê xwegihandina LGBTI+ên yextiyar û yên yextiyar dibin, tendurustiya wan û di warên curbicur de rewşa, pêdivî, daxwaz û endîşeyên wan, Li gor encamên van anketan ev rapor hat amadekirin. Herwiha ji bo kesên li Ewrupa û Emerîkayê yextiyar dibin jî lêkolîn li ser sîxorteyên civakî û yên emeklîbûnê hatin kirin û bi yên Tirkiyeyê re berawirdkirin. Ji bilî vê Ji bo pisporên Xizmetên Civakî û xebatkarên tendurustiyê jî nîşe hatin amadekirin.  Ji bo k udi raporê de derbarê asta perwerdehîyê, rewşa xebatê, jiyana rojane ya bajarê lê dijîn pergala malbat û piştgiriyê û bicîbûnê û di qadên mafî yê curbicur de bi taybetî di warê tenduristiyê de û herwiha pêşnîyar û tecrubeyên beşdaran jî dê cîh bigire di çalakîyê de ji ber wê hûn ê bikaribin di gelek waran de bibin xwedî agahî.

Axêver: Ozge Gokpinar

***Kesên dixwazin beşdar bibin divê formê beşdarbûnê dagirin.***

**Seet: 19:00- 21:00 Cîh Cezayîr Panel: Em ê bi berxwedanê bi ser bikevin**

Di sala 2013an de me bi çalakîyên Gêzîyê re ji bo Hefteya Serbilindiyê gotbibû “Berxwedan”. Herçend ku sal li pey hev derbas bûn, li dijî hemû fobî û dijminantîyên li hemberî hebûna me, polîtîkayên dewleta baviksalar, heteroseksizm û tundîyê em dîsa dibêjin “Berxwedan”.

Moderasyon: Hatice Demir

Axêver: Ferîde Eralp- Tevger Femînîst û Meşa Şevê ya Femînîst ya 8ê Adarê- Okan Altekîn- Baroya Diyarbekirê Şevval Kiliç- Berxwedana Gezîyê û Lubunya Mert Guneş, Şevval Durmagit- Berxwedana Bogaziçiyê- BULGBTI+

**Seet: 19:00 21:00 Cîh: Zoom Panel: “ Em Anatomîya Seksa Ewle ji nû ve Xêz dikin”: Zewq, Rîsk û Bazara HIVê**

Em 4 xalên seksa ewle ji bo nîqaşê vedikin. Em ji nû ve, bi nêrînên cuda û heqîqeta zanistî ve bala xwe didin têgehên mîna astengî, zewq, riza û mahremîyetê û ji hêla beden û subjeya kuîrê ve ji nû ve şîrove dikin. Em ê li ser vê mijarê nîqaş bikin, Navgînên astengkirina HIVê û tedawîya wê ya biyomedikal di salên dawîn de pêş ketîye, em ê bala xwe bidinê ka ev tedawî û pêşketin çi tesîrê li ser jiyana seksî ya LGBTI+yên HIV bi wan re heye û tune ye kirîye.  Nîqaşên ku di kargehê de bên kirin dê ji hêla xêzkarên kuîr ve bên xêzkirin. Bi vî awayî em didin pey vê armancê ku derveyî serwerîya heteronormatîf, normên bîyomedîkal û exlaqwarî anatomîyek ewleya seksê ji nû ve saz bikin.

**Moderasyon:** Erkin Akbay

Alîkar: Mahremîyet- Enes Salar Riza- Oguzhan Uzun Onlem- Oguzhan Nuh Haz- Tankut Atuk

*Hejmara beşdarvanan dîyarkirîye kesên dixwazin beşdar bibin bila ji kerema xwe formê beşdarbûnê dagirin.

**Saet: 19:00-21:00 Cih: Şeva Helbestê ya Cezayîrê: Meriv Carinan bi Berxwedanê Dibe Sîwanek: Şeva Taybet ya Helbestê ya Meha Rûmetê**

Berî niha me wekî SPOD di nav xwe de şevên helbestê li dar dixistin lê me vê carê xwast em tev bi hev re di Meha Rûmetê de li gel rengvedana hunera Kûîrê ya nav helbestê bibînin û bîr bînin ku sîwana me li her derî rengorengo vedibe, me xwast vê carê vê armanca xwe bi saya serê helbestê pêk binin.

Dixwazî helbesteke tu jê hez dikî bîne tu dixwazî helbesta te bixwe nivisiye bîne, qehweya xwe, şereba xwe yan jî dixwazî nexwîne û guhekî xwe bide me, dildara min were em bi helbestê li ber xwe bidin.

**<u>22ê Pûşperê Roja Çarşemê</u>**

**Saet:14:00-15:00 Cih: Zoom Suhbet: Di Berxwedanê de Serfirazî***

Di vê çalakiya me de, çalakgerên LGBTI+ karibin tevî bernamî bibin û wê ev çalakî wekî suhbetekê bi rê ve here û em ê li ser meseleyeên wekî; em çi qas cih didine meseleya serfiraziyê, serfirazî bixwe çi ye û çi nîn e, serfirazî di xwe de çi dihewîne û em wekî Lûbûn çalaksazîkirinê çi şexsî û çi jî bi hev ra çi qas dikarin berdewam bikinê biaxivin. Bi saya vê formata û çalakiyê hem em ê nêrînên cûda hîn bibin hem jî em ê li gel rê û rêbazên ku em nû hîn dibin karibin behsa sîstemên berxwedanê bikin. Armancavê çalakiyê ev e; Em dixwazin bi vê xebata xwe mijara 'mirov wê çawa tevbigere û çawa serfiraz bibeyê' derxînine pêş û em hem çawa dikarin asta çalakbûna xwe, çi ya şexsî çi jî ya bi hev ra bibin hem jî xwe ji halê neyînî yê ji têkçûnê û ji travmaya talîyê xelas bikin û hunera xwe ya berxwedanê xurt bikin. Ji ber wê ev suhbeta me wê li ser rê û rêbazan hev û fikrên hevûdu yên celebcelebî be.

Alîkar: Aras Örgen - Komeleya 17ê Gulanê (17 Mayıs Derneği)

Herçî kesên dixwazin beşdar bibin, divê formê dagirin

Saet: 17:00-19:00 Cih: Wê bo Beşdaran Agahiyê Were

**Forum: Turkiye Amedeyê vê Ye: Tatava Yapıyoruz.**

Em li ser Beşdarbûna LGBTI+ yan ya Siyasî  Diaxivin*

Em bi hev ra û ji bo LGBT+yan, li ser giringî û pêdiviya peydakirina mekanên ewle ku karibin pê li ser siyasete rojane biaxivin, derdikevine rê. Em li gel tecrubeyên tevgera xwe ya sîyasî sîyaseta îro, bo wezereta siyasî û siyasetmedarên ku di wan wezeraten de xwedî gotin in û hêviyên xwe yên beşdarbûna LGBTI+yan ya siyasî xeber didin

Moderasyon: SPOD Bîrîma Beşdarbûnê ya Siyasî (Siyasal Katılım Birimi)

*Kotaya Beşdaran dê Sînordar be Herçî Kesê Dixwaze Beşdar Bibe Divê Forma Beşdariyê Dagire

Saat: 17:00-19:00 Cih: Cezayîr

**Panel: Şînbûna Aşitiyê ki Rabirdûya Nêzîk bo Dahatûya Gengaz LGBT+yên ku salên 2013-2018an li Amedê Jiyabûn**

Em ê di çarçoveya vê bernamê de behsa LGBT+yên ku salên 2013-2018an li Amedê jiya ne û tûşî cihêtîyê hatine û serî hildanên wan yên salên 2013-2015 wekî dewra aşitiyê û salên 2015-2018 wekî dewra şerr bikin û em ê nîqaşê li ser nûveyên Şînkirina Aşitiyê bikin û em ê bi we re par ve bikin û nîşanî we jî bidin bê ka çi qas pêdivî LGBT+yan heye bo civakek li hev were û aşitiyê bîne nav civakê bikin.

Axêver: Atalay Göçer - bakad (Barış için Kültürel Araştırmalar Derneği) Aysel Fidan - bakad (Barış için Kültürel Araştırmalar Derneği)

Saat: 19:00-21:00 Cih: Atolye ya Cezayirê: Hûn ê bi transan ve bibine wekî hev: 18ê Pûşperê Roja Wekheviyê ya bi Transan re!

18ê pûşperê, ev roj roja berdeldayînên mezin yên transan e ku Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê hebûna transan ev roja ji kategoriya 'Girêcan'iyê (ruhsal bozukluk) derxist. Ev Berxwedana Gewre ya Transan bi dest xistineke mezin e. Her çi qas DSÖtê hebûna transan ji kategoriya 'girêcan'iyê derxistibe jî bi hin hincetên 'medîkal' li ser hebûna me cihêtiyê dikin û poltikaya xwe didomînin. Em ê di vê çalakiya xwe de li hel hev li ser hebûna xwe û li ser pergala hevzayendiyê û berxwedana transan ya cîhanê biaxivin.

Alîkar: Efruz - Pembe Hayat Derneği

Saet: 19:00-21:00 Cih: Nîşandana Kurtefilmê Cezayîrê Kısa Film Gösterimi + Panel: Nîjadperestî, Dijberiya li Hember Mişextiyan, Dijminiya li LGBTI+yan û Berxwedan

**Proje: Nîşanda Kurtefilm a Bêdeng+ Panel:Nîjadperestî, Dijberiya li Hember Mişextiyan, Dijminiya li LGBTI+yan û Berxwedan, Komeleya Medyayê û Koç amade kiriye.**

Anîmasyona ku ji vîdeoyan pêk tê wê li ser cihêkariya ku rojane li mişextiyan tê kirin bi kurtfilma 'Proja Bêdeng' ê dest pê bike (gotin yên mişextiyan in) di vê panelê de popîlîzîm a rastgiriyê û mezinbûna nîjadperestiyê, rikeberiya medyayê û piştgiriya medyayê û rewşên tûşbûnê yên mişextiyan werine nîqaş kirin. Li gel mezinbûna rik/rikeberiyê him dijminiya li mişextiyan tê kirin him jî ya li LGBTI+yan bixwe pê re dijminiya kesê him mişextî kiriye him jî LGBT+yê û yekcar bûye hedef û rêyên ku em xwe bigihînin wan û zehmetiyan û çareseriya van zehmetiyan li gel pratîkan dê were neqil kirin.

Axêver:

Doç. Dr. Polat S. Alpman (Göç Araştırmaları Derneği / GAR) - Yeni Milliyetçiler, Mülteciler ve Alelade Nefretler Pırıl Erçoban (Mültecilerle Dayanışma Derneği) - Mültecilerin Karşılaştıkları Ayrımcılık Halleri Hayriye Kara (Kaos GL) - Irkçılık ve LGBTI+ Düşmanlığına Karşı Mülteci LGBTI+'larla Birlikte Mücadele Dilek İçten

(Medya ve Göç Derneği) - Mültecilere yönelik Irkçılık ve Nefret Söyleminin Medyadaki Yansımaları

Saet: 19:00-21:00 Cih: Cezayîr

**Panel: Axiriya Dinyaya ku Em Dizanin: Meydanxwendina bo Îdeolojiyên li dij Zayenda Civakî**

Dinyaya ku di jiyana rojane de tê pêşber me, ya ku em nasyarê wê ne diguhere, pê re destkeftiyên tevgerên civakî jî tên tarumar kirin;ev yek bi pandemiyê re, bi qeyrana îqlimê re, bi teknolojiyên nû yên şer û bi hilbûna îdeolojiyên li dijî zayenda civakî re. Di nav vê hemû xumamiyê re pîvaneek heye ku dikare bo me bibe referans; arezûya me ya dinyayeke wekhevîparêz û demokrat. Bi îlhama ji Wallerstein, di panela “Axiriya Dinyaya ku Em Dizanin: Meydanxwendina bo Îdeolojiyên li dij Zayenda Civakî” de em dê bergeha fireh ya îdeolojîk binirxînin bê ka çawa zanyariyên di derbarê têgeha “Zayenda Civakî”de hatine sazkirin, em dê li hewlên îdeolojiyên li dij koçberan, yên nijadperest, mîlîtarît, muhafezakar binerin ku dixwazin bo femînîzmê werin temellukirin. Bi heman şiklî em dê wê yekê binirxînin bê ka “zanist” di argumanên transqewirîner (trans dışlayıcı) de çawa tê emilandin û hilberîn. Di bersivên ku dê bo van hemû nîqaşan werin dayîn, di dest me de bi tenê du pîvan heye. Dinyaya wekhevîparêz û demokrat. Werin em bi hev re vê li ser vê dinyatê bisekinin û meydanxwendinên afrîner-nûxwaz bi rêxistin bikin.

Moderasyon: Ezel Sönmezocak, Aylime Asli Demir

Axêver: Arya Zencefil, Çağla Akdere

<u>**25ê Hezîranê, Şemî**</u>

Saet: 13:00-15:00 Cih: Mala Boysanê

**SPOD Suhbetên Bazarê, Suhbetên Hefteya Rûmetê**

Ev civînên ku di 3yê tîrmeha 2016an de wekî “Suhbetên Vebûnê” dest bi faliyeta xwe kirine, bêpere ne û pêdivî bi randevûstendinê nabînin, di mijarên , LGBTI+ yê de li gel moderatorên hevsal yên ku ji yekîneya SPODê ya Piştgiriya Psîkososyal û Tenurustiya Ruhî perwerde hildane û bi awayekî bipergal supervîzyonê hildidin, tên birêvebirin.

Di van civînên ku sazkirina qadên ewle tên esasgirtin, heftane mijarek tê hilbijartin û di heabên medyaya civakî yên SPODê de tên ragihandin û li dor vê yekê ji hêla beşdaran ve veguheztina tecrube, hest û fikran tê kirin.

Bi veguheztina herka tecrube/zanyarin û piştgiriya nava komî ya di civînên Suhbetên Bazarê ve derfet û delîvê tên dabînkirin ku LGBTI+ yî bêyî veşartina nasnameyên xwe yên zayendî û meylên xwe yên zayendî li derdoreke ewle li gel hev bimînin.

Saet 17:00-18:00 cîh: cînemaya Kadikoyê Nîşandana

**filman: bijarteya KuirFest #DirenAyol!**

Jiyanê Kuir ji ber gelek sedeman bendemayîn û neheqîyan yasayî, civakî û aborî tekoşîneke makro û mîkro tê dayîn. Hebûneke bi nasnameyeke vekirî, jiyaneke bi nasnameyeke girtî jî bi tena serê xwe dide nîşan ku lubunya çiqasî bi hêz û serbilind in. Em dizanin 'her meşa me meşa serbilindîyê ye' henaseya ku em dikişînin û gava em davêjin serfirazîye. Di vê bijardeya me de, em ê çîrokên kuirên ku li dijî civakê, hevalên xwe û pergalê li ber xwe dane û li dijî wan di her merhakeyeke jiyanê de bi xurur û ser bilindî tekoşîneke wêrek didin.

Saet: 18:00-21:00 Cîh: cinemaya Kadikoyê

**Kokteyl +18. hormanlu Domates LGBT+ Xelatên Fobî**

18:00 Kokteyl + 18:30 Merasîma Xelat dayînê 18. car Fobîkên LGBT+ bi pêşkêşîya Jilet Sebahat em dikin bi bahcan

Saet: 21:00 Cîh: Mecra Partî:

**Afto Parto ya bi hormon**

Piştî ku me fobîk kirin bi bahcan em hev li pîsta dansê bibînin.

**24 Hezîran ÎN**

SAET 13:00-17:00 Cîh: Atolyeya Cezayîr: “Cruising Galaxsies”, li ser avakirina utopyaya Kuir Bilim Kurgu nivîskarîya afirînerî

Kargeh di lêgerîna dahatuyên travmatîk û dîspotîk de ye û armanc ew e ku di roja me de nêrînên rexneyî zêde bike, bi fikra kuîr, piştî koçê û rojavayî xwêş bixîne. Kargeh gotegotên pirgotinî dike perçeyekî kollektîf û ji bo têkîlîyên utapya- dispotya, dahatu-rabirdu û diaspora- welat kifş bike dê kargeh li Stenbol û Berlînê pêk were. Kargeh ji hêla Îrem Aydina ku berîya niha bi platforma çandî Maviublayê re derhêrnerîya şanoya Waving Bodeîsê kirîye ve tê birêvebirin. Piştî kargeha ewil a li Berlînê niha jî dê ya duyem li Stenbolê pêk were.

Ji bo beşdaran tecrubeyan nivîsan zanistî ne pêwist e. Kargeh dê bi tirkî û ingilîzî be kî bixwaze ew ê bi wî zimanî binivsîne. Heke hûn bixwazin bîyografî û motivasyona xwe ya beşdarbûnê binivsîin. Ji bo nasîna we em gelekî kelecan in.

Moderator: İrem Aydın - Derhêner/ Organizatora Civatê, Efemine

*Hejmara beşdaran bi sînor e kesên dixwazin beşdar bibin divê forma beşdarbûnê dagirin.

Ev proje ji hêla NEUSTART KULTURê ve di warê Fonds Darstellende Kunsteyê bi fonên Hikumeta Federal a Almanyayê ve piştgiriyiê distîne.